05.B KURDISCH

1 Kopyaya ji bo dê û bavan
1 Kopyaya ji bo saziyê

HÛN BI XÊR HATI HÊLÎNA ME

DESTÛRNAME

Ji bo bikaranîna wêneyên şexsî û agahiyên taybet ên di hêlîna zarokan de ku di dema kar de hatine wergirtin _____ / Yên saziyên berpirsyar _____ Yên Hêlînê _____ herwiha ji bo dezgehên medyaya çapkirî

Bi vê armanca wêne, grafik, qeydiyên video ango xêzikên zarokan bi aweyekî taybet dikarin bên tasfir kirin (çêkirin ango kişandin).

Di rewşên musaît de, em dixwazin agahiyên di derbarê jiyana hêlîna me de, bi awayekî berfireh, bi raya gştî re parve bikin. Lewra bi taybetî xebatên ku di di çarçoveya perwedekariyê de hatine kirin, çalakiyên Hêlînê, xebatên hatine kirin û wêneyan biweşînin.

Di êrêkirina vê destûrnameyê de hûn bi dilê xwe ne (azad in).
Ji derketina destûrê ango betalkirin ji bo we ne kêmasî ye..

Ez/ Me van agahiyên qanunî (parastina jiyana taybet) wergirt:

- Mafên weşandina wêneyan û xebitandina wan, nabe mijara tazmînatê, heya ku şekil û naveroka wê neyê guhertin. Deng, video û qeydiyên filman nakevin nava vê destûrnameyê.
- Herwiha ev destûrname destûrê nade dezgehên çapameniya çapgirî yên ku bi Hêlînê re dixebitin, yên derveyî herêmê, ango yên ku saziyên berpirsyare dixebitin. Ji bo bikaranîna datayên wêneyan tenê dikare di rewşên taybet de, destûrê bê dayîn.
- Dema xwesteka/karê çapê hatibe dayîn, destûra ji bo çapkirinê hatî dayîn, êdî nayê betal kirin.
- Heya betalkirinê destûrname bêdawî derbas dibe. Ev di prensîbê de tê wateya heya sala hêlînê –ku ger tiştekî din nehatibe dayîn- herwiha di derbarê endametiya hêlînê de jî derbas dibe.
- Dema wênêyên zaroka/ê min/me di înternetê de bê weşandin, li çar aliyê cîhanê herkes dikare gazî van wêneyan bike û wan bibîne. Herwiha datayên wêneyan dikarin malpêrên lêgerînê de jî bên dîtin. Lewra kesên din, ango saziyên din dikarin wêneyên ser înternetê ji xwe bikarbînin û bi van wêneyan ji xwe re profilekî sazi bikin. Herwiha dikarin van wêneyan bigewrînin û ji bo armancên din bikarbînin. Destûrnameya ji bo weşandina înternetê hatî dayîn ez dikarim/ em dikarin hertim betal bikim, ji bo vê jî pêwiste bi nivîskî rêveberiya hêlînê were agahdar kirin.
- Rojname, herwiha dezgehên din ên çapameniya nivîskî dikarin wêneyên di înternetê de hatî weşandin bibînin û ji xwe re bînîn xwarê (kopya bikin). Wêne û agahiyên di înternetê de hatî weşandin li çar aliyê cîhanê dikarin werin dîtin, werin kopya kirin û werin qeydkirin, herwiha bi dateyên din re werin bikaranîn. Gelek zehmet e ku mirov agahiyên di înternetê de hatî weşandin jêbibe (ango bavêje).
- Di heman demê de mafê weşandin û bikaranîna wêneyên ku bi zarokên me /min re hatî kişandin nehatiye dayîn.

Ein Kooperationsprojekt von:

AWO Landesverband Brandenburg e.V.

Landkreis DAHME-SPREEWALD

Unterstützung und finanzielle Förderung:

LAND BRANDENBURG
Ministerium für Bildung, Jugend und Sport

Ez/ Em

Nav | Pêşnav | Nav | Pêşnav

Kolan û nemra xanî, PLZ, Cih

ez/ me qebûl kiriye ku wêne û xebatên zaroka/zarokê min/me

Nav | Pêşnav | Roja ji dayîkbûyînê

Di van dezgehên medyayê de were weşandin:

- ☐ Rojnameya Hêlînê
- ☐ Di berhemên çapkirî yên hêlînê / yên saziyên berpirsyar / yên komelayan de
- ☐ Di rojnameyên rojane de
- ☐ Di raporên salane û kovarên endametiyê de
- ☐ World Wide Web (Di malpera hêlînê ya înternetê de / ya saziya berpirsyar de
- ☐ Malpera fecebookê ya hêlînê / ya saziya berpirsyar
- ☐
- ☐

Ez qebûl dikim / em qebûl dikin ku wêneyên dijital ji aliyê dê û bavên din ve bên daliqandin ku têde zaroka/ê min / me xûya dibe ku ev wêne di derbarê jiyana rojane ya hêlînê de agahiyan didin. Herwiha ev wêne di saziyê de dikarin bên daliqandin. Di dema daliqandina wêneyan de, wêneyan ku bi zaroka/ zarokê min / me re hatine kişandin, ez ji bo belavkirina van wêneyan li dijî rêveberiya hêlînê derkevim, ez zerer nabînim / em zerar nabibînin.

☐ erê ☐ na

Ez qebûl dikim ku wêneyên mirovan, bi taybetî di forma kom ango wêneyên bi serê xwe, ji aliyê hêlînê ango nûnerên dê û bavan ve, bê kişandin.

☐ erê ☐ na

Ez / Em hatin agahdar kirin ku ger min / me destûra belavkirina wênayan nedabe û wêne ji aliyê min/ ji aliyê me ango ji aliyê kesên din ve were belav kirin, wê demê mafê dayîna tazmînatê dikare were bikaranîn. Bi taybetî weşandina di înternetê nayê qebûl kirin.

Cih, Dîrok | Îmzeya dê û bav ango ya kesên ji zarok berpirsyar

Bingeha qanûnî: Weşandina ji bo raya giştî tenê dikare bi pejirandina Destûrnameyê pêk were, § 22 Qanûna mafê telifê ya di derbarê berhemên hunerî yên resm û wênekêşiyê. (KunstUrhG).